

hişyar bû, strana "Ey Dîlberê" got. Hemû doktor matmayî man û pirs kirin: "Ev çi ye mamoste?" Û wî weha bersivand: "Ez ji nû ve ji dayîka xwe bûm. Çavên xwe nû li cîhanê vedikim. Bê guman ku ez ê bêjim." Û bi vê têkliya mezin, Aram di nav 20 rojan de baş bû.

Hevalan em li mala Mehmet Uzun kirin mêvan. Hîn nû ji nexweşxanê derketibû. Li gel ku nexweş bû jî, ji pirtûkxanê çend pirtûk derxistin û got: "Di nav van pirtûkan de pir tiştên xweş hene ku mirov dikare ji wan besteyan çê bike. Divê ez çê bikim." Tu carî xwe vala nedihîşt.

-Pirtûkên Mehmet Uzun bûn?

-Belê pirtûkên wî bûn. Piştî ku em vejeriyan Yunanistanê, ji wan notên ku girtibûn, 5-6 beste çêkirin. Notayên wan sererast kirin û ew bi dawî kirin.

-Tomara deng heye?

-Na tune. Her tiştî amade kir, lê nekarî deng tomar bike. Ji ber nexweş bû. Doktoran ji bo 4 mehan gotina stranên û lêdana cumbuşê lê qedexê kiribûn.

-Hûn dê çi bikin bi van berhemên?

-Ez ê wan veşêrim û nedime kesekî. Rojekê, ez ê bidime kesekî ku paşnavê Tîgran li ser e. Ez ê wan ji neviyên xwe re bihêlim.

PIŞTÎ DERMANÊN LI ATÎNAYÊ NEXWEŞ KET

-Angaş hat kirin ku di encama dermanên şaş de ku doktorek li Atînayê danê Aram Tîgran nexweş ketiye...

-Piştî em ji Amedê vejeriyan Atînayê, doktorek Kurd ji Sûriyê bi navê Îbrahîm hebû. Aram ji ber ku ev doktor bi kurdî dizanî, çû balê. Dîsa di vegereke me ya ji Amedê de, ji bo xwînê bide çû kontrolê. Lewre diviya ji 15 rojan carekê xwîn bidaya. Doktor jê re derman nivîsîne, wî jî ji doktor re gotiye: "Min dermanên xwe yên 3 mehan bi xwe re anîne. Dema biqedin ez ê bêm." Doktor jî gotiye: "Wan dermanan bikar neyne. Ez ê dermanên nû bidime te." Piştî ku Aram nerazîbûn nîşan daye jî, doktor gotiye: "Wê demê ez ê li te nenihêrim." Hat malê û vê bûyerê vegot. Min jî jê re got: "Here doktorek din." Lê Aram got:..

"Ev jî doktor e, dizane. Tiştêk nabe, ez biçime balê." Heta ku carek doktorên Amedê li doktorê Atînayê geriya ne û gotine ku te çima dermanên weha dane Aram.

Bi rastî jî, dermanên ku doktorên li Amedê danê, lê dihatin. Piştî ku dest bi bikaranîna dermanên doktorê li Atînayê danê kir, xerab bû, xwîna wî av girt. Piştî 15 rojan jî ji xwe ve çû û me ew rakir nexweşxanê. Em dê mîna malbat dî ve yekê bernedin. Ev doktor bû sedema mirina Aram. Ne şekir, ne kolestrol û ne jî nexweşîneka din a Aram hebû.

SED SAL JÎ DERBAS BIBE DÊ WESIYATA ARAM PÊK BÊ

-Dewleta tirk destûr neda ku cenazê Aram bibine Amedê. Ji bo vê hûn dê çi bêjin?

-Dewleta Tirk zalim e. Dewleteke qetlîamkar e. Di hemû dîroka xwe de li ser gelên cîran zilm kirine, pêkutî kirine. Bi qasî ku ji bedena bê can a Aram Tîgran bitirsîn xwe xistin.

Lê sed sal jî derbas bibe, dê wesiyeta Aram Tîgran were cîh. Dê giyana wî şad bibe. Ew dê rojek ji sedî sed biçê Amedê. Temenê min tere neke jî, hevalên wî û Kurd dê wî bibine Amedê. Baweriya min bi vê yekê xurt e.

-Her çendî Aram Tîgran ermen be jî, bi Kurdan re bûye yek. Kurd îroj şîna wî digirin. Hûn dixwazin çi bibêjin?

-Aram Tîgran, li gel 75 saliya xwe jî, dixwest ji bo kurdan tiştêk bike. Dixwest stranên nû çê bike, muzîkên nû durust bike. Û digot: "Em dê rojek teqez bigihêjine azadiya xwe." Min rojek jê re got: "Ji te re çi? Em ermen in." Bi min re xeyidî bû û got: "Tu çi dibêjî? Belê ez Ermen im. Ez nikarim dîne xwe înkâr bikim. Lê ev 50 sal in ez bi Kurdan re me. Ez perçeyekî Kurdan im. Ez neferekî vê têkoşînê me. Dê rojek teqez welatê me azad bibe." Di van demên dawî de timî li benda daxuyaniya Abdullah Ocalan a 15ê tebaxê bû. Meraq dikir ku gelo dê çi bêje. Aram heya nefesa xwe ya dawî jî, ji bo gelê Kurd xebitî.

Ji ber wê ye ku ev du heftî ne kurd li ser lingan in. Li seranserê cîhanê şîna wî tê girtin, bîranînan li dar dixin. Ev ne tiştên piçûk in. Ev ji bo me şanzî ne, taca serê me ne. Ez bê sînor spasiyên xwe ji bo gelê Kurd pêşkêş dikim. DTP pir xebitî. Ji bo wesiyeta wî bînin cîh, pir hewl dan. Em ji hemiyar re minetdar in.